kuşatma altında tutarken şehri teslim almak ve Hıristiyanların geleceğini garanti altına almak görüşmek istiyordu. Savaşmadan Kudüs'ü almak istiyordu. Kanın akmasını istemiyordu. Baroniler ve ruhani liderler, Sultan Selahaddin'in getirdiği önerileri hakaret olarak kabul ediyorlardı. Haçlıların yardımını bekliyorlardı. Selahaddin askerlerim şehre girdiği zaman kılıçlarına karşı sizleri nasıl koruyacağımı bilmiyorum demişti.

Aralarında anlaşma sağlanmayınca savaş başladı. Onuncu gün Selahaddin'in askerleri şehre girdiler. Kudüs'ü korumak için Selahaddin mağlup olan karşı tarafla anlaşta. Özgürlüklerini satın almak amacıyla erkekler için on, kadınlar için beş ve çocuklar için iki dinar alınacaktı. 30 bin êcus alınacaktı. Kendisine teslim edilen savaş ganimetinden hiçbir şey almadı. Aldığı ganimeti askerler ve kadınlar arasında paylaştırdı. Esirlere karşı yumuşak davrandı. Kiliseyi Suriyeli Hıristiyanlara bıraktı. Kendisi ve kardeşi Adil'in emriyle 1.500 fakir Hıristiyanlardan para almadan serbest bıraktı. Kudüs te kalmak isteyen kalır. Gitmek isteyen gider dedi. Şehrin bütün kapılarını kapattı. Yalnız Davut kapısını açtı. Kendisi kuvvetlerinin başında Davut kapısında bekledi.

Kafilenin başında Kudüs Patrşği Heraclius vardı. Resmi ve gayri resmi papazlar onu takip ediyordu. Papazlar Kudüs'ü terk ederken, Kilisenin kıymetli eşyalarını da beraberinde götürüyorlardı. Papazları takriben Vali ve Kudüs'ün saygınları geçti. Kadınlara sıra geldiği zaman, kadınlar Selahaddin'in ayaklarına kapıldılar. Bizler her şeylerimiz hatta vatanımızı kayıp ettik dediler. Yanınızda esir tutduğunuz kocalarımızı, kardeşlerimizi ve çocuklarımızı bizlere iade ederek çektiğimiz acıları azaltarak yardımcı olmanızı diliyoruz dediler. Kadınların ricası üzerine Sultan Selahaddin bütün esirlerin özgürlüklerini

yaşandı. Tamamen çembere alınan Haçlı orduları çok uğraştıkları halde çemberi yaramıyorlardı. Yanında bulunan oğullarına savaşa katılmalarına savaşa katılmaları için emir verir. Sizin göreviniz Müslüman askerlere örnek olmaktır der. Ben hasta olmasaydım sonuna kadar Haçlı ordularıyla savaşacaktım der. Dört yıl sonra Selahaddin, Şam'a dönerken büyük bir büyük bir sevinçle karşılaşır.

4 Mart 1193 yılına 56 yaşındayken vefat eder. Selahaddin Eyyubi'nin kısa hayat hikâyesini yazdım.

Mangalda kül bırakmayanları görüyoruz. Bazıları konuştukları zaman, sanki kendileri bütün dünyayı zapt etmişler gibi görünüyorlar. Tansu Çiller Başbakan iken, oğlu havuz başında mini etekli kızlarla dans ederek askerlik yapıyordu. Askerlik süresi dolduğu zaman, birlik komutanı arıyordu Tansu

Hanımın oğlunu bulamıyordu ki tezkeresini versin.

Bana göre uzun bir süre oldu, halen Gazze de İsrail ve Filistin savaşı devam ediyor. Her geçen gün ölü sayısı artıyor. Silahsız ve savunmasız insanların ölümüne üzülüyorum. İsraili Bakanın oğlu Gazze cephesinde Filistinlilerle savaşırken öldürüldü.

Ben her türlü savaşa karşıyım: Savaş vahşettir, cinayettir, katliamdır.

Merhum Mele Mustafa Barzani'nin sözüdür: Allah şahittir; savaşı sevmiyorum. Çünkü savaş, bir sorunu hal etmenin en kötü yoludur. Ancak Baas Partisi bize bir yol bırakmadı. Onların bize getirdiği önerinin onların lehine Kerkük'ten ve başka bölgelerden ödün vermemezden başka bir anlamı yoktu. Bu ise imkânsızdır. Bu uğurda her şeye hazırız, hepimizin öldürülmesine karar verseler de... Çünkü ben, Kürtlerin kabrime gelip tükürerek, niçin Kerkük'ü sattın? Demesinden korkuyorum.

Kurt Şex Seidin AİLESİNİN TARİHÇESİ

Mahmut Fevzi Fırat

Şeyh Said Efendinin şahadetinden 98 yıl ötdü.

İstiklal Mahkemesi'nin gizli arşivleri açılmalı..

Şeyh Said Efendi 1865 yılında Elazığ'ın Palu ilçesinde dünya ya geldi. Dört yaşında iken babası Şeyh Ali Efendinin Oğlu Mahmut Fevzi Efendinin irşad vazifesi ile görevlendirmesi nedeniyle Erzurum'un Hınıs ilçesi Kolhisar köyüne yerleştiler. Şeyh Mahmut Fevzi Efendinin vefatından sonra Şeyh Said Efendi dedelerinden kalan yüzyıllara dayanan medrese geleneğinin feyzini buradan kardeşi Şeyh Bahahddin Efendi ile neşvünema etmeye koyuldu. Şeyh Said Efendi, kendini ilme irfana adanmış, İslami eğitimin yanı sıra ticaretle meşguliyeti sebebiyle Şam a, Halep'e, Bağdat'a, Medine'ye, Mekke'ye ve ayrıca gittiği Hindistan'da Hint Müslümanlarının dili olan Urducaya ve ayrıca Arapça, Farsça, Kürtçe ve Türkçe dillerine de hâkimdir ve Ermeniceyi telaffuz edebilmektedir. Şeyh Said Efendinin hinterlandının genişliği, ilmi bilgisi, ticaret vasıtasıyla gittiği yerlerde çok geniş bir çevreyle irtibatı, onun olaylara vukufiyettini derinleştiriyordu. Rus

Mele Selim Rus Konsolosluğuna sığınır. Şeyh Hasen Efendi Çabakçur mıntikasında saklanır. Şeyh Said Efendi o dönemde büyük bir projenin uygulanmakta olduğunu ve Osmanlı İmparatorluğunun parçalanacağını sezer. Bu nedenle Osmanlı İmparatorluğunun birleştirici, yani bir arada tutucu İslami düşüncesinin siyasi odağı olan Hilafet Makamının ilgasına vesile olabilecek bir hareket olarak 1908 Meşrutiyet olayını görür. 1923 Cumhuriyet ilanı ile birlikte artık birleştirici vasfı olan dinin merkezini ilga edildiğini (ortadan kaldırdığını) ve tek ulus, tek dil dayatmalarının hayata geçirilmesi neticesinde artık birlikte yaşama zemininin ortadan kalktığını gören Şeyh Said Efendi, dönemin önde gelen aşiret reislerine, ulemaya, tarikat erbaplarına ve münevverlere bu durumun kabul edilebilirliğinin olamayacağını mektuplarında belirtir. Buna rıza gösterilemeyeceğinden bahisle, her toplumun yasalarını oluştururken referansları, yani başvuracakları kaynakların; inançları, örfleri ve töreleri olması gerektiğini, aksi takdirde başkalarının inançları, töreleriyle oluşan yasalarına uymanın mümkün olamayacağını belirtir. O dönemde Kürdistan coğrafyasında aşiretçilik, tarikatçılık



İslami bir bilinç ile donanmış halk kitlelerini, hiçbir güç hiçbir silah yenemez!

Şehid Şeyh Said Efendi K.S.

ŞEYH SAİD EFENDİ
ŞEVDALILARI GRUBU

olmayan yargıçların verdiği kararlar temyize dahi gönderilmeyerek karakuşi bir yargılama sonucu malum olay vuku buldu. Gayri resmi

üzerindeki etkisini devam ettirdi. Şeyh Said hareketi başladığında dönemin iktidarı aldığı resmi bir kararla, hadiseye içerde Kürtçü diyerek Kürt olmayanların katılımını engellenmeye, dışarıda da hareketin irtica hareketi olduğu propagandası yaparak dış desteği kesmeyi hedeflemiştir. Bugün dahi bir bütün olarak Şeyh Said hadisesi sahiplenilmiyor. Kimi parti, grup veya örgütler hadisenin Kürt tarafını öne çıkararak sahiplenirken, kimileri ise dini tarafını öne çıkararak sahipleniyor. Oysa hadiseye bir bütün olarak bakmak gerekir ve bu bakış açısının bugünün mevcut statükosunun yıkılması için büyük bir fayda sağlayacağı kanaatindeyim. Şeyh Said hadisesi ile yüzleşmeden, bütün yönleriyle masaya yatırıp açıklığa kavuşturmadan, bugün çözümlenemeyeceği aşıkardır. Bunun için de cesurca adımlar atılıp İstiklal Mahkemesi zabitleri ve gizli arşivlerinin açılması gerekir. Uluslararası konjonktür Kürt meselesi çözümünü bir bütün olarak önüne koymuş görünmüyor. Kürt güçlerinin dağınık ve irtibatsız olması yanında, Kürtlerin milli demokratik hak ve özgürlük talepleri yerine muhatap kabul edilen taraf, iktidardan kendilerine statüko istemini öne koymuş ve iktidarın da bununla iktifa ettiği görülmektedir. Gerçekten bu topraklarda barış isteniyorsa, devletin, milletin inancıyla, dokusuyla bütün gerçekleriyle yüzleşmesi ve barışması gerekiyor. Bu anlamda Kürt meselesinin çözümü bu hakikatlerin hayata geçmesiyle mümkün olabilecektir. Umarım çok geç kalınmadan günü birlik politikalar yerine köklü çözümlere hayatıyet kazandırılır.

Şehid Şex Seidê Pîran 'in torunu Mahmut Fevzi Fırat ın DENG Dergisinin 97. sayısına verdiği röportajından alınmıştır.

(28-29) Haziran 1925




ŞEHİD NAMIRIN

Osmanlı Savaşı' sonrasında Rusların Ermenileri Müslümanlara karşı kışkırtması neticesinde İttihat ve Terakki Hükümeti Ermeni tehcirine karar verir. Şeyh Said Efendi tehcir esnasında Ermeni katliamlarına rıza göstermediği gibi mallarına, canlarına kast edilmemesi için fetva verir. Şeyh Said Efendi Ermenilerin sürülmesi ve katledilmesini netice itibarı ile Kürtlerin Batı tarafından yalnız bırakılacağına vesile teşkil edeceği intibasını o dönemde çeşitli mahfillerde dile getirmiştir. 1908 meşrutiyet ilanına amcası Şeyh Hasan Efendi ve Melle Selim-ê Dimilî ile birlikte muhalefet eder. Akabinde 1913'te Bitlis olayı vuku bulur. Bu olay sonucunda Seyid Şahabeddin ve Şeyh Ali idam edilir.

oldukça yaygındır. Buna Kürtlerin milli hassasiyetlerinin henüz olgunlaşmadığını da eklersek, çağdaş anlamda kitlelerin örgütsüz olduğu gerçekliği yanında, diplomasi eksikliği ve askeri anlamda organizasyonun oluşmadığını da bilmekteyiz. İngiltere ve Fransa gibi işgalci ülkelerin, hatta yeni kurulmuş olan Sovyetlerin bile Kürt hareketini desteklemediği gibi, karşı oldukları da bir vakadır. Bütün bunları üst üste koyduğumuzda bir provokasyonla daha hadiseler olgunlaşmadan içerden ve dışarıdan patlak verdirilerek sonucun baştan beri akamete uğrayacağı kesindi. Akabinde dünya tarihinde az rastlanır bir garabeti farika olan İstiklal Mahkemesi kuruldu. Hukukçu

verilere göre, bu kıyamın sonucunda hadiseye iştirak eden 14 şehir, 700 köy, 9000'e yakın ev harabeye döndü. 50.000 kişi göç ettirildi, yaklaşık 7.500 kişi zindanlara atıldı, 660 kişi idam edildi. 80.000 Kürt öldürüldü. Dönemin muhalefeti susturuldu. Kürtlerin bir ulus olarak varlığı inkâr edildi, dili yasaklandı, Kürt diliyle eğitim yapan medreseleri kapatıldı. İnancını, örfünü, geleneğini yaşamaya çalışan insanlar üzerinde büyük baskılar uygulandı. Kemalist rejim kendisine muhalif olan bütün odakları susturdu. Şeyh Said Hareketi, 1925'ten bu günlere kadar dahi süren despot, diktatör, laikçi bir statükoya karşı mücadele eden kendisinden sonraki hareketlerin

Serok Nêçîrvan Barzanî pêşwaziya Konsulê nû yê Brîtanyayê kir



Îro danê êvarê Serok Nêçîrvan Barzanî pêşwaziya Konsulê Giştî yê Brîtanyayê li Herêma Kurdistanê James Goldman kir.

Ji aliyê xwe ve, birêz Goldman kêfxweşiya xwe nîşan da ku weke konsulê giştî yê Brîtanya li Herêma Kurdistanê hatiye destnîşankirin û dupat kir ku welatê wî dê berdewam be li ser piştgiyaya Herêma Kurdistanê û dixwaze di hemû waran de bigihêje destkeftan bo pêşxistina peywendiyên xwe li gel Kurdistanê.

Her du serokan rewşa Iraq, Herêma Kurdistanê û navçeyê jî gotûbêj kirin.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî pîrozbahî li Serokê Azerbaycanê kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê nameyeke pîrozbahiyê ji Îlham Aliyev re şand, bi boneya ku



careke din wek Serokê Azerbaycanê hat hilbijartin.

Li gor daxuyaniya Ofîsa Serokwezîriyê, Serokwezîr Mesrûr Barzanî di nameyê de, gerimtirîn pîrozbahî Aliyev kir, bi boneya hilbijartina wî wek Serokê Azerbaycanê û hêviya serkeftinê jê re xwast.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî amadebûna Herêma Kurdistanê ji bo pêşxistina peywendiyên dualî di warên cuda de tekez kir.

Hilbijartina Serokomariya Azerbaycanê roja Çarşemê birêve çû û Îlham Aliyev bi rêjeya ji sedî 92 ê dangan ji bo cara pêncemîn wek serokê wî welatî hat hilbijartin.

Li cîhanê çend milyon Kurd hene û li kîjan welatan dijîn?

Nifûsa Kurdan, ku yek ji gelê herî mezin ê Rojhilata Navîn e, her sal zêde dibe. Yanî li dinyayê çend milyon Kurd hene? Li kîjan welatan çend Kurd dijîn? Hejmara Kurdên li cîhanê bi teqezî nayê zanîn.

Çavkaniyên cuda nifûsa Kurdan bi awayên cuda dihejmêrin û pîvanên cuda bi kar tînin. Ji bo diyarkirina nifûsa Kurdan rêbazên wek serjimartinên fermî,



rapirsîn, lêkolîn, texmîn û pêşbînî tînin bikaranîn. Lêbelê, her yek ji van rêbazan bi pîrozgîrêk û sîno-dar in.

EW LI KÎJAN WELATAN DIJÎN?

Kurd li gelek welatên cîhanê dijîn. Lê belê herêma ku Kurd herî zêde lê dijîn Rojhilata Navîn e. Kurd li Rojhilata Navîn, li ser xaka Kurdistan a ku di navbera Tirkîye, Îran, Iraq û Sûriyê de parçekirî ye û li gelek welatên din dijîn. Li ser hejmara Kurdan di çavkaniyên cuda de hejmarên cuda hene.

Li jêr, daneyên texmînkirî yê li ser nifûsa Kurdan, ku ji hin çavkaniyan hatine berhevkirin, tînin dîtin.

Nifûsa Kurdan li hin welatan wiha ye:

- 1- Tirkîye: 32,812,439 2
- 2- Îran: 18.281.137 3
- 3- Iraq û Herêma Kurdistanê Federal: 7.949.571 4
- 4- Sûriyê: 3.642.117 5
- 5- Almanya: 1.898.319 6
- 6- Welatên din ên Ewropayê: 1.892.691 7
- 7- Kazakistan: 892.638 8
- 8- Gurcistan: 758.009 9
- 9- Ermenistan: 699.571 10
- 10- Îsraîl: 592.622 11
- 11- Efxanistan: 312.075 12
- 12- Pakistan: 234.006 13
- 13- Misir: 153.561 14
- 14- Sûdan: 101.000 15
- 15- Bosna-Hersek: 8.788

Li gor van daneyên lêkolînkirî, nifûsa Kurdan li cîhanê ji 70 milyonî derbas dibe.

Li Amedê tevî dorpeçê 'Meşa Azadiyê' didome

'Meşa Mezin a Azadiyê' ku ji bajarên Wan û Qersê dest pê kir, 13 roj şûnde li Amedê li hev civiya û tevî astengkirina bi hezaran polîs jî bi tevîbûna gel a bi coş 4 saetan meşiyar.

'Meşa Mezin a Azadiyê' ku di 1'ê Sibatê de ji bo azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest pê kir, di roja 13'an de didome. Siyasetmedar û nûnerên rêxistinên demokratîk ên di meşa Wan û Qersê de cih digirtin li Amedê li hev civiyan.

Namzetên hevşaredariyê yê DEM Partiyê, Dayikên Aştiyê û nûnerên saziyên sivîl ji bo pêşwazîkirina meşvanan li ber Navenda Bazirganiyê ya Ceylanlar kom bûn. Gel bi stran, dirûşm û tilîliyan bi erbane li benda meşvanan bû. Dema ku şaxên Qers û Wan gihîştin ber AVM'ê ya Ceylanlar li ser astengkirina polîsan alozî derket.

Piştê jî meşvan bi çepik û dirûşman hatin pêşwazîkirin. Polîsên Tirk meşvan asteng kirin. Parlamenteran dest dan hev û li hemberî astengiya polîsan li ber xwe dan. Hevserokê Giştî yê DBP'ê Keskîn Bayindir di çalakiyê de axivî û got, "Ev meş wê bigihêje armanca xwe. Me heta niha serî li ber zextên we netewand û ji niha û pê ve jî serî natewîne. Hûn nikarin gelê me bi polîtîkayên çewisandin û tirsandinê rawestînin. Em bi hezaran kes li vir in."

Parlamentera DEM Partiyê Newroz Uysal jî got, "Ji bo me her kolana Amedê qada xwepêşandanê ye. Em ê kolan bi kolan bimeşin û armanca meşê vebêjin."

Dayikên Aştiyê dorpeça li ber kargeha Ceylanê şikandin û tevî meşê bûn. Dayikên laçikên spî li xwe kiribûn bi qurnefîlan meşvan pêşwazî kirin.

Dayikên Aştiyê dorpeça li pêşiya Ceylan AVM'ê derbas kirin û tev li meşvanan bûn. Dayikên laçikspî meşvan bi qurnefîlan pêşwazîkirin. Dayikan, li gel meşvanan stran gotin û coşa meşê hêj mezintir kirin. Di hevdîtinê de



gelek caran dirûşmên "Bijî berxwedana Îmralityê" û "Bijî berxwedana zindanan" hatin berz kirin. Gelek welatî jî li şaneşînên malên xwe tev li vê coşê bûn.

Piştî gefa "mudaxileyê" ya polîsan, parlamenteran rê ji trafikê re girtin. Piştî rakirina dorpeçê jî meş dest pê kir.

Meşa ku li pêşiya AVM'a Ceylanê dest pê kir, heta navçeya Sûrê berdewam kir. Bi hezaran polîsan di tevahiya rêyê de çalakan dorpeç kirin. Lê belê tevî vê yekê jî nekarîna coşa gel asteng bikin. Welatîyên di şaneşînên malên xwe de û li ser cadeyan jî meşvan silav kirin.

Li pişt Oryil Petrolê û semta Ofîsê bi sedan kesan meşvan bi dirûşma "Bijî Serok Apo" pêşwazî kirin. Gelemperiya girseyê ciwan bûn. Tevî mudaxileya polîsan jî ciwanan li kolanan dirûşm berz kirin. Piştî meşa 4 saetan, meşvanan xwe gihandin Cadeya Gaziyê û piştê jî heta pêşiya Mînareya Çarling meşiyar.

LI BER MÎNAREYA ÇARLING DAXUYANÎ HAT DAYÎN

Piştî meşê parlamentera Partiya DEM Partiyê Newroz Uysal li ber Minareya Çarling axivî û got, "Em di zivistanê de ji Wan û Qersê derketin rê. Em ji bo azadiya Birêz Ocalan û çareseriya pîrozgîrêka Kurd hatin heta v' derê. Ev rê rêya azadiya Birêz Ocalan e."

Hevserokê Giştî yê DBP'ê Keskîn Bayindir jî wiha got: "Em îro bi hezaran kîlometre meşiyar û hatin Amedê. Gelê me di rê de

piştgirî da me. Em spasiya wan hemûyan dikin. Me xwest pîrozgîrêka Kurd bi rêyên demokratîk çareser bibe. Muxatabê vê birêz Ocalan e. Ev sedsal in siyaseta înkâr, asîmîlekirin û îmhayê li ser kurdan tê meşandin, lê nikarin vê pîrozgîrêkê çareser bikin. Îro bi hezaran polîs li vir kom kirine, wê tu encamê ji van polîtîkayan negirin. Ev meş û berxwedan ne yê 13 rojan e. 100 sal berê dest pê kiriye û ev berdewamiya wê ye. Pîrozgîrêkên li Kurdistan û Tirkîyeyê her ku diçe girantir dibin. Banga me ji her kesî re ew e ku rê û rêbazek ji bo çareseriya aştiyane ya vê pîrozgîrêkê bibînin. Kes bi vê pîrozgîrêkê re wê bigihêje tu derê. Çareseriya birûmet û aştiyane ya vê pîrozgîrêkê divê ne tenê li ser milê me be. Her kesên ku li vî welatî aştiyê dixwaze, divê bîpîrozgîrîya xwe bi cih bîne."

Bayindir di dawîya axaftina xwe de bal kişand ser têkoşîna 100 salan a Kurdan û wiha domand: "Ev sedsal bi berxwedana gelê Kurd hat roja îro. Rêberê vê berxwedanê Birêz Ocalan e. Divê tecrîd bê şikandin û azadiya fîzîkî ya Birêz Ocalan bê misogerkirin. Ji bilî vê tu rêyeke din tune. Daxwaza me aştiya birûmet e. Gelê me ji Wanê heta vir piştgirî dane me. Em ê teqez daxwazên gelê xwe pêk bînin." Daxuyanî bi berz kirina dirûşmêyan û firandina kevokên aştiyê bi dawî bû.

Meş wê 15'ê Sibatê li gundê Amara yê ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan lê ji dayik bûye bi dawî bibe.

Daxuyaniyek ji Ofisa Ragihandinê ya Serokwezîrê Herêma Kurdistanê ve

Nivîsgeha Hikûmeta Herêma Kurdistanê daxuyaniyek li ser çawşekariya hin malper û rûpelên torên civakî belav kir ku hewl dane



nêrîn û daxuyaniyên Serokwezîr Mesrûr Barzanî di hevpeyvîna ligel kenala "NBC" de bi aliyekî din ve bibin.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Hin malper û rûpelên medyaya civakî yên navxw bi belavkirina hinek daxuyanî û şiroveyên neguncaw û dûr ji rastiya qada siyasî û ewlekarî ya Herêmê, hewl dane ku nêrîn û daxuyaniyên serokwezîr di hevpeyvîna ligel kenala "NBC" de bi aliyekî din de bibin." Di beşeke din a daxuyaniyê de hatiye: "Serokwezîrê Kurdistanê tekezî li ser parastina qewareya destûrî ya Herêma Kurdistanê kiriye û berdewam jî dibe di girtina hemû tedbîran de, ji bo dîrxistina metirsiyên li ser Herêma Kurdistanê."

Her di daxuyaniyê de hat gotin: "Xwevedizîn û xapandina li hember nehezan, ti metirsî û gefan kê nake, ji ber wê jî divê her kes li hember xak û xelkê Herêma Kurdistanê di asta berpirsyariyê de be."

Sîrwan Rojbeyanî wek Cîgirê Parêzgarê Neynewayê hat hilbijartin

Encûmena Parêzgeha Neynewayê îro civiya û bi piraniya dangan, Sîrwan Rojbeyanî ji Firaksiyona



Partiya Demokrat a Kurdistanê, wek cîgirê yekem ê Parêzgarê Neynewayê hat hilbijartin. Encûmena Parêzgeha Neynewayê îro 10.02.2024an, bi amadebûna hemû endamên encûmenê civiya. Tê de Sîrwan Rojbeyanî ji Firaksiyona PDKê wek cîgirê yekem ê Parêzgarê Neynewayê û Omer Namiq Mela ji Hevpeymaniya Çarçoveya Hevahengiyê wek Cîgirê Duyem ê Parêzgarê Neynewayê hatin hilbijartin Xuleya çarem a 18.12.2023an, hilbijartinên encûmenên parêzgehên Iraqê (ji bilî Herêma Kurdistanê) birêve çû. Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) jî 4 kursî bidest xistin û Cîgirê Yekem ê Parêzgar bidest xist.

Tirkîyeyê Til Temir topbaran kir

Artêşa Tirkîyeyê sayloya gundekî Til Temirê topbaran kir. Çavkaniyên xwecihî yên ji nahiyeya Til Temirê ya Rojavayê Kurdistanê diyar dikin ku



artêşa Tirkîyeyê û grûpen çekdar gundê Um El-Kêfê yê Til Temirê topbaran kir.

Di wê topbaranê de, sayloya (avahiyên zirav û bilind ên ji bo depokirina dexlûdan) gundê Um El-Kêfê hatiye armanckirin.


Tirkiye ji 5ê Çiriya Pêşîna 2023yan ve, êrişî Rojavayê Kurdistanê dike. Tirkiye di van êrişên xwe de saziyên sivîl û ên xizmetguzariyê dike hedef. Santralên karebayê, birên av û petrolê jî gelek caran dibin hedefa êrişên Tirkîyeyê. Li gorî gelek şirovekarên, Tirkiye dixwaze bi rêya van êrişên xwe xelkê herêmê koçber bike.

Serok Nêçîrvan Barzanî digel Serok û Endamên Dadgeha Pêdaçûnê civiya

Nêçîrvan Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê, roja sêşemê 13.02.2024ê, digel Serok, Cîgirên Serok û Endamên Dadgeha Pêdaçûnê ya Herêma Kurdistanê civiya.

Di civînê da ku, birêz Wezîrê Dadê yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî tê da amade bû, pirsra paşxistina biryara Dadgeha Bilind a Federal a Iraqê ya di derbarê yasaya hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê û aliyên destûrî û yasayî û lêkeft û encamên wê hatin gotûbêjkirin.

Birêz Serokê Herêma Kurdistanê tekez li ser wê yekê kir ku, Serokayetiya Herêma Kurdis-



tanê û aliyên peywendîdar dê hemû rêkarên destûrî û yasayî yên ji bo lidarxistina hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê wer-

bigrin û di vî warî da dîtin û nêrînên beşdarên civînê bi girîngî hatin wergirtin û dê bi ciddî kar li ser bê kirin.

Serokê serîhildana milletê Kurd a 1925ê Şêx Seîd û hevalên xwe îro jî rêya me rohnî dikin

Teşkilata Azadiyê (Komîteya Îstîklalê) ya ku serokê wê Xalid Begê Cibrî bû, biryar dabû ku, bi amadekarî û xebateke sîyasî, leşkerî, civakî li Bakurê Kurdistanê serîhildanekê dest pê bike.

Dewleta Tirkîyeyê, bi vê biryarê hesîya û ji bo rê li ber vê serîhildanê bigire, berîya ku serîhildan dest pê bibe, Serokê Tevgera Azadiyê Xalid Begê Cibrî û rêvebirê Tevgerê Yusuf Ziya Beg girtin.

Di roja 13yê Sibata 1925an de jî, di demeke ku Şêx Seîd tê Pîranê, leşkerên Dewleta Tirkîyeyê dora wê mala ku Şêx Seîd û hevalên xwe lê dimînin digrin û dibin sebep ku şerekî mezin li wê derê derkeve û serîhildana bi rêberatiya Şêx Seîd bi vî rengî, ji wexta ku hatibû plan kirin zûtir û bi bê amadeyî destpê dibe.

Di demeke kurt de serîhildan li gelek bajar û deverên Bakurê Kurdistanê belav bû.

Lê ji ber ku serîhildan bêyî amadekarîyeke pêwîst destpêbibû, piştî du mehan, Şêx Seîd ji bo ku bikaribe hêzên xwe biser hev bîne, paş ve vekişîya.

Di roja 14yê Nîsana 1925an de Milazim Qasim(Binbaşi Qasim) ê hevlîngê Şêx Seîd bû, Şêx Seîd û hevalên wî, li ser Pira Abdurahman Paşa ya ku li ser Çemê Mûradê ye xistin kemîne û li wê derê Şêx Seîd û hevalên wî teslîmî Dewleta Tirkîyeyê kirin.

Di eynî rojê de, di roja 14yê Nîsana 1925an de li gorî biryara Dîwana Herbê ya Bedlîsê, li Hefsa Bedlîsê Xalid Begê Cibrî û Yusuf Ziya Beg ji aliyê Dewleta Tirkîyeyê ve hatin kuştin.

Şêx Seîd û 46 hevalên wî di Mehkemeya Îstîklalê ya Şerqê

ya Dewleta Tirkîyeyê de bi awayekî bêhiqûqî hatin darizandin û di roja 29ê Hezîrana 1925an de li Amedê li Qada Deriyê Çiyayî (Dağ Kapı Meydanı) hatin darvekirin.

Ev serîhildana ku bi serokatiya Şêx Seîd pêk hat, di encamê de bi qetil kirina bi deh hezaran Kurdan û bi şewitandin û wêran kirina bi sedan gundan di nav rûpelên dîrokê de cîhê xwe girt.

Dewleta Tirkîyeyê, heta îro jî cîhê mezê Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî û Yusuf Ziya Beg û 46 hevalên wan veşartî hiştine û nîşanî malbatên wan nekirine.

Serîhildan û Tevgera Kurd a bi serokatiya Şêx Seîd efendî, li dijî wê sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya ku milletê Kurd tune hesabandîye û xwestîye tune bike, nîşan û sembola rûmet û hebûna milletê Kurd bû, nîşana daxwaza mafên netewî û demokratîk yên milletê Kurd û nîşana dazwaza azadiya Kurdistanê bû.

Şêx Seîd serokekî netewî, olî û civakî yê milletê Kurd û yê kurdistanîyan e; rûmeta me ye.

Ew agirê ku Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Yûsûf Zîya Beg û hevalên wan ji bo azadiya milletê Kurd û kurdistanîyan pêxistibûn, ew hişmendî û hestên netewî, niştimanî yên Şêx Seîd efendî û hevalên wî, weke pêleke doza azadiyê berê xwe da Agiriyê, Dêrsimê, ji wê derê çûn Mehabadê û nuha jî li Hewlêrê li ser Parlamentoya Herêma Kurdistanê bûye ala serfiraziyê û li ba dibin.

Îro li Rojavayê Kurdistanê gelê me jibo destkeftinên xwe bipêrêze û ji bo berfirehkirina wan destkeftinên xwe, jibo mafên xwe yên netewî, kulturî

û demokratîk têdikoşe.

Li Rojhilatê Kurdistanê jî agirê azadiyê di astên cuda û bi şeweyên cuda, bêwestan berdewam dike û geş dibe.

Li Bakurê Kurdistanê jî eve 100 sale li himberî sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya li ser esasê înkâr, îmha û asîmilasyonê tê meşandin, têkoşîna azadiya milete kurd ya ji bo azadiya Kurdistanê ranewestîyaye.

Sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê îro jî her li ser wê hişmendîya 100 sale berdewame tê meşandin. Em bangî Dewleta Tirkîyeyê dikin da ku dest ji wê sîyaseta xwe ya beyhûde ya înkâr, îmha û li dijî kurdan berde û gavên ewil ji bo qebûl kirina nasnameya milletê kurd û bicîhanîna mafên wî yê neteweyî, demokratîk bavêje. Ji bo vê jî, divê dawî li şerê heyî, şidetê û hemû çalakîyên çekdarî bêne anîn; divê bi hemû partiyên sîyasî û dezgehên sivîl ên milletê Kurd dîyalog bê destpe kirin.

Tecrübeya 100 salî ya Cimhûriyeta Tirkîyeyê îspat kirîye ku, heta pirsra Kurd û Kurdistanê çareser nebe, dê li Tirkîyeyê jî azadî, demokrasî, edalet û wekhevî pêkneyê.

Di 99emîn salvegera destpêka serîhildanê de em Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Yûsûf Zîya Beg, Dr.Fuad û hemû rêvebir û beşdar û şehîdên serîhildanê û hemû şehîdên Kurdistanê bi rêzdarî bi bîr tînin.

Bi vê wesîleyê em careke din dîyar dikin ku divê Dewleta Tirkîyeyê cîhê mezê Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Yûsûf Zîya Beg û 46 hevalên wan, cîhê mezê Seyîd Riza û hevalên wî û cîhê mezê Seîdê Nûrsî aşkere bike.

13.02.2024

Ez kêfxweş im ku beşdarî Lûtkeya Hikûmetan a Cîhanî dibim

Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi serokatîya Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr



Barzanî dê ji 12 heta 14 Mijdarê bi diruşmeya "Vizyona Hikûmetan" beşdarî Lûtkeya Hikûmetan a Cîhanî ya Dubayê bibe.

Civîna Hikûmetê ya Cîhanê roja Yekşemê li Dubayê dest pê kir û sibe wê bi fermî vebe.

Di lûtkeyê de berpîrsên payebilind, pispor, bîrarder, rêberên ramanî û hejmarek ji rêxistinên navdewletî dê beşdar bibin.

Civîna lûtkeyê bi amadebûna 25 serokên dewlet û hikûmetan, 85 rêxistinên navdewletî, hikûmetê û hejmarek ji rawşenbîr û şarezayên cîhanê beşdarî lûtkeyê dibin.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî îro yekşemê (11.02.2024) li ser vaxwandina taybet a Şêx Mihemed Bin Reşîd El Mektûm Cîgirê Serok, Serokwezîr û Rêvebirê Hikûmetên Îmaratê yên Dûbaî ber bi Îmarata Erebi ve çû û dê ji 12 heta 14 Mijdarê berdewam bike.

Ji aliyekî din ve, Serokwezîr Mesrûr Barzanî li ser tora civakî ya Xê nivîsî: "Ez kêfxweş im ku beşdarî Lûtkeya Hikûmeta Cîhanî dibim."

Kurd û Sune li dijî derkeftina hêzên Amerîkayê ji Îraqê ne

Sune jî wekî Kurdan tevî rûniştina Civata Nûnerên Îraqê ya girêdayî binpêkirinê li ser ax û serweriyên Îraqê ji aliyê Amerîkayê ve nebûn. Ev jî wekî amajeyekê ji bo dijatiya wan li beran-



berî pêngavên Şîeyan ji bo pîrsa derxistina hêzên biyanî bû.

Suneyan tirs ji vekêşana hêzên biyanî ji Îraqê heye, ku kom û milîşyayaên Şîeyan zêdetir destê xwe dabînin ser deverên wan.

Piştî sala 2017ê û lawazbûna DAIŞê, Şîeyan piraniya deverên Suneyan kontrol kirin. Ji bo Suneyan wesa diyar bû ku Heşda Şebî hindî ku ji bo dagirkirina deverên wan hatibû, hind ji bo aliyê ewlehiyê û bihêzbûna desthilata hikûmetê nehatibû.

Piştî lawazbûna DAIŞê, bîrarder bû ku Heşda Şebî ji deverên Suneyan derkeftiba, lê heta niha jî berhev nîne wan deveran berbide. Suneyan hest bi wê yekê kiriye ku armanca Heşda Şebî mana herdemî ye, herwesa biçûkkirina ddesthilata Suneyan û guhertina demografiyê ye.

Çi hêzeka serbazî ya girêdayî Suneyan li deverên wan nîne, hêzên heyî di çarçoveya kom û milîşyayên girêdayî Heşda Şebî ya Şîeyan de ne. Şîeyan hêzên xwe yên çekdarî li hemî cihên Îraqê belav kirine û ji bo bîrarda siyasî jî tenê Bexdayê rewa dibînin.

Hêzên Şîeyan ên desthilatdar wesa difikirin ku divê desthilat hemî li Bexdayê be û ew li ser tevaya Îraqê bîrarder bin, hemî bîrarderê ji Bexdayê werbigirin û desthilata Îraqê navendîtir bibe û bîrardanên siyasî jî li ser bîngeha piraniyê bîn dan, ku ew jî di berjewendiya Şîeyan de ye ji ber ku ew piranî ne.

Nêçîrvan Barzanî bi serok û endamên Dadgeha Pêdaçûnê re civiya

Nêçîrvan Barzanî ji bo hilbijartinêna Parlamentoya Herêma Kurdistanê bi serok, alîkarê serok û endamên dadgeha pêdaçûnê ya Herêma Kurdistanê re civiya.

Civîn li Serokatîya Herêma Kurdistanê hate lidarxistin.

Serokatîya Herêma Kurdistanê li ser civînê daxuyaniyek belav kir.


Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku Wezîrê Dadê yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî di civînê de amade bû û wiha got:

"Pîrsa paşxistina bîrarda Dadgeha Bilind a Federal a Îraqê ya li ser yasaya hilbijartinêna Parlamentoya Kurdistanê û aliyên destûrî, yasayî, îmkan û encamên wê hatin gotûbêj kirin."

Li gorî daxuyaniyê, Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî tekezî li ser wê yekê kir ku "Serokayetiya Herêma Kurdistanê û aliyên pêwendîdar dê hemû rêkarên destûrî û yasayî yên ji bo lidarxistina hilbijartinêna Parlamentoya Kurdistanê wergirin.

Di vî warî da dîtî û nêrînê beşdarên civînê bi girîngî hatin wergirtin û dê bi cidî kar li serê bê kirin."

Paşxistina hilbijartinêna Parlamentoya Kurdistanê



Dihat çaverêkirin ku hilbijartinêna Parlamentoya Kurdistanê di 25ê Sibata 2024an de bihata kirin.

Hilbijartinêna ku dihat çaverêkirin di bin çavdêriya Komisyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Îraqê de bîn kirin, ji ber doza li Dadgeha Federalî hat paşxistin.

Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan pêşniyar kir ku hilbijartin di navbera 19 û 30ê Gulanê de bîn kirin.

Rêveberê Fermangeha Karûbarên Yasayî ya Parlamentoya Kurdistanê Şarmîn Bahcet Xidirê pêr ji Rûdawê re ragihand, "Serokê Dadgeha Bilind a Federal a Îraqê bîrarda da ku rûniştina

gilyên li dijî qanûna hilbijartinêna Parlamentoya Kurdistanê ji bo 18ê Sibata were paşxistin."

Şarmîn Bahcet Xidirê da zanîn ku serokê dadgehê dê roja 18ê Sibata bîrarda xwe ya dawî derbarê wê mijarê de eşkere bike.

Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê (YNK) di Gulana sala borî de li dijî 5 xalên yasaya hilbijartinêna Herêma Kurdistanê îtiraz kiribû, li Dadgeha Bilind a Federalî ya Îraqê doz vekiribû.

Ev îtiraz li ser hejmara kursiyên Parlamentoya Kurdistanê, bazneyên hilbijartinê û kotaya kursiyên a li Parlamentoya Kurdistanê ye.

Heyetên Partîya Welatparêzên Kurdîstanê Li Mêrdînê Seredanê Partiyên Sîyasî û Sazîyan Dikin

Heyetên Partîya Welatparêzên Kurdîstanê (PWK) Li Mêrdînê Seredanê Partiyên Sîyasî û Sazîyan Dikin.

Şandên Teşkilata Mêrdînê ya Partîya Welatparêzên Kurdîstanê (PWK) di rojên 08-09/02/2024 an de li Qoserê bi şandekê seredana hinek partiyê sîyasî, komele û sazîyên sîvil û meslekî kirin.

Şandên PWKyê, ji bo danasîn û pêşkêşkirina sîyaseta PWKyê ya) di derbarê hilbijartinêna herêmî yên 2024ê ku bi şîara "werin em namzedên xwe bi hev re tesbît bikin, werin em bajarê xwe bi hev re birêvebin" bi tirkî û kurdî (kurmancî, kirdkî-zazakî, li gel bernama û deklarasyona PWKyê pêşkêşî aliyên peywendîdar kirin. Di roja 08/02/2024an de bi şandekê kû ji endamê Meclîsa Partiyê ya PWKyê M. Nezîr GELERÎ, rêvebirêna PWKê Omer ERDEM û Osman ÇEPER pêk hatibû, bi Serokê Partîya GELECEK ya Navçeya Qoserê Emin AYDIN, Serokê Partîya HAK-PAR (Partya Maf û Azadîyan) ya Navçeya Qoserê Ramazan İlhan û bi Serokê CHPyê yê Navçeya Qoserê İsmail YAMAN û bi rêvebirêna van partîyan re hevdiştin pek anîn.



Di roja 09/02/2024 an de şanda PWKyê ku ji Cîngirê Serokê Giştî yê PWKyê Bedran ACAR, endamên Meclîsa Partiyê ya PWKyê M. Nezîr GELERÎ û Nûrettîn KILIÇ pek hatibû, serdana Serokê Komelaya Muxtarên Qoserê Hatîp ŞERAN, Serokê Odeya Hunerkar û Esnafam ya Qoserê (Esnaf ve Sanatkarlar Odası), Serokê Partîya DEVA (Demokrasî ve Atılım Partisi) ya Qoserê Mehmet BIÇAK û Serokê Komele ya Cotkaran Mîkaîl ERBEY re hevdiştin pek anîn.

Di her du hevdiştinan de jî revebirên PWKyê helwest û proja kû PWKyê di derbarê hilbijartinêna herêmî yên

2024ê de diyar kiribû, bi nivîskî pêşkêşî aliyên peywendîdar kirin û bi awayekî giştî helwesta PWKê di derbarê tifaqên milî demokrat û Kurdîstanî pênase kirin.

Berpîrsên partiyê sîyasî, komele û sazîyan ji ber van seredanan kefxweşî û spasîyên xwe pêşkêş kirin, gilî û gazincên xweyî bê hevkarîyê û bê tifaqîya Kurdan anîn zimên.

Di van hevdiştinan de diyar dibe ku, pêwîstîyeke mezin bi diyalog û danûstendîna di navbeynan partiyên sîyasî û sazîyan de heye.

Serdanên şandên PWKyê yên li Mêrdînê berdewam dikin.



Îsrail êrişê Refahê kir

Li gor ajansa fermî ya Filistine Wafa rayedaren nexweşxaneyên Refehê diyar kirin ku di erîşên Îsrailê li ser bajarê Refehê de ji 100î zedetir kes mirin, bi sedan kes birindar gihandin nexweşxaneyan.

Li gora medya Erebi jî nawenda bajarê Refahê bûye armanca êrişên Îsrail.

Rêveberê Nexweşxaneyê Suheyb El-Hims diyar kir ku nexweşxane di rewşeke gelekî xeternak de jî birindar bûye û derman û serum têra wan nake.

Mesrûr Barzanî û Erdogan civiyan



Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî û Serokomarê Tirkîyeyê Recep Tayyip Erdogan civiyan.

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî û Serokomarê Tirkîyeyê Recep Tayyip

Erdogan, di çarçoveya "Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmetan" de li Dubaiyê ne.

Di çarçoveya lûtkeyê de Mesrûr Barzanî û Erdogan îro saet 15:00ê civiyan.

Di civînê de ji bilî Wezîrê Karên

Derve yê Tirkîyeyê Hakan Fidan, wezîrê parastinê, enerjî, çavkaniyên sirûştî û bazirganî yê Tirkîyeyê jî amade bûn.

Her du aliyan di civînê de rewşa giştî ya Îraq û herêmê û geşepêdana pêwendiyên dualî gotûbêj kirin.

Li gorî daxuyaniya Hikûmeta Herêma Kurdistanê her du aliyan tekezî li ser bihêzkirina hevkarî û hevahengiyê ji bo parastina ewlehî û aramiya herêmê kirin.

Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmetan a li Dubaiyê doh bi tevîbûna çend serok û serkirdeyên welatên Rojhilata Navîn û cîhanê dest pê kir û biryar e heta sibê berdewam bike.

Mesrûr Barzanî doh li lûtkeyê axivîbû û bal kişandibû ser mafê rewa yê Kurdan ê diyarkirina çarenivîsa xwe.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî sersaxiyê li malbata Reşîd Sindî dike

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di peyamekê de sersaxî li malbata



fermandarê dêrîn ê Pêşmerge Reşîd Sindî kir.

Di peyama Serokwezîr Mesrûr Barzanî de hat: "Bi xemgînî û xemeke mezin, nûçeya koça dawî ya fermandar û têkoşerê me yê naskirî yê Kurdistanê xwedêjêrazî Reşîd Sindî gihîştê min. Em sersaxiyê ji malbata xwedêjêrazî û xizmên wî re dixwazin, ji Xwedayên mezin daxwazkar in ku giyanê xwedêjêrazî bi bihuştê şad bike û sebr û aramiyê bide xizm û hevrêyên wî."

Reşîd Sindî Fermandarê Pêşmerge yê her du şoreşên Îlon û Gulanê, îro 12ê Sibata 2024an li Zaxoyê di temenê 93 saliyê de koça dawî kir.

Konsolê Giştî yê Îmarat li Hewlêrê: Gotara Serokwezîr Mesrûr Barzanî girîng û ciyawaz bû

Konsolê Giştî yê Îmarata Erebî li Hewlêrê ragihand derbarê beşdariya Serokwezîr Mesrûr Barzanî di Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmetan de ragihand, "Serokwezîr Mesrûr Barzanî weke mêvanekî xweşewîst serdana Îmaratê kiriye û gotara wî jî girîng û ciyawaz bû."

Konsolê Giştî yê Îmarata Erebî li Hewlêrê Ehmed El-Zahir derbarê beşdarbûna şanda bilind a Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi serokatiya Serokwezîr Mesrûr Barzanî di Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmetan li Dubey de bersiva Kurdistanê da.

Ehmed El-Zahir got: "Amedebûna birêz Mesrûr Barzanî weke mêvanekî xweşewîst li Îmarat û di Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmetan de û herwiha



hevdîtina wî ligel Serokê Îmarat Şêx Mihemed Bin Zayid Al Nehyan, girîngiya peywendiyên Îmarat li gel Iraqê û bi taybetî ligel Herêma Kurdistanê nîşan dide.

Konsolê Giştî yê Îmarata Erebî li Hewlêrê got jî: "Giringiya van civînan ew e ku dê peywendiyên bihêztir û berfirehtir bikin. Giring e ji bo veberhênana Îmaratê li Herêma Kurdistanê zêdetir û bihêztir bibin. Gotara Serokwezîrê Herêma Kurdistanê di lûtkeyê de jî gelek girîng û ciyawaz bû."

Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmetan li Dubey doh (Duşem, 12.02.2024) bi tevîbûna Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî û 25 serok û serkirdeyên welatên Rojhilata Navîn û cîhanê, şandiyên 85 rêkxistinên navdewletî, 300 wezîran û 120 şandên hikûmetan hat destpêkirin, û heta sibe (Çarşem, 14.02.2024) berdewam be. Serokwezîr Mesrûr Barzanî doh gotareka girîng bi zimanê Ingilîzî di wê lûtkeyê de pêşkêş kir û bal kêşa ser guhertin û pirsên niha yê deverê û cîhanê. Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê di gotara xwe de tekez jî kir ku gelê Kurdistanê daxwazeka rewa ji bo destnîşnakirina mafê çarenivîsê xwe heye û pêdivî ye rêz li mafên gelê Kurd ên rewa bê girtin.

Mezlûm Ebdî li ser 'vekişîna Amerîkayê' û 'garantiyan' peyamên girîng dan

Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD), ji ber êrişên ku demên dawiyê zêde bûne ji Amerîkayê sîstema parastinê ya asmanî xwest.

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk Mezlûm Ebdî ragihand ku wan garantî ji berpirsên pilebilind ên Amerîkayê wergirtiye ku dê erkên xwe yê li Rojavayê Kurdistanê berdewam bikin.

HSDyê 5ê vê mehê ragihand, "Di êrişê li Rojhilatê Dêrezorê de şeş şervanên me şehîd ketin."

HSDyê destnîşan kiribû ku ev êrişê bi dronan ji herêmên di kontrola Hikûmeta Sûriyeyê de hatiye kirin.

Li nûçeya DWyê, Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk Mezlûm Ebdî ev êrişê grûpên çekdar ên nêzîkî Îranê wekî "bûyereke xeternak" bi nav kir.

Mezlûm Ebdî herwiha anî zimên ku li Rojavayê Kurdistanê pêwîstiya wan bi sîstema parastinê ya asmanî heye.

"Amerîkayê garantî da me"

Mezlûm Ebdî li ser helwesta Amerîkayê jî wiha axivî:

"Amerîkayê em piştrast kirin ku dê ji bo astengkirina êrişên bi rengî hewl bide. Rayedarên Koşka Spî û Pentagonê garantî da me ku dê li Rojavayê Kurdistanê bimînin.



Helbet dibe ku paşerojê vekişin em nikarin li hêviyê bin ku dê Amerîka heta hetayê li vir bimîne."

"Êrişên Tirkîye û DAIŞ dê zêde bibin"

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk hişyarî da, "Heke Amerîka vekişe dê êrişên Tirkîye, DAIŞ û grûpên nêzîkî Îranê gelekî zêde bibin."

Mezlûm Ebdî amaje pê kir ku Amerîkayê HSDyê wekî "mutfika herî girîng a bejahiyê" dibîne.

"Ger Amerîka vekişe..."

Mezlûm Ebdî li ser egera vekişîna Amerîkayê jî got:

"Ger Amerîka ji ber şert û mercan vekişe em dê jî berê xwe bidin planên li gorî berjewendiyên gelê xwe û hevkeşeyên li herêmê."

Niha ji çaran yekê Sûriye û di Rojavayê Kurdistanê di destê Hêzên Sûriyeya Demokratîk de ye

û ev herêm bi navê Rêveberiya Xweser û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê binavkirin.

Derdora 900 leşkerên Amerîkayê li vê herêmê hene û bi HSDyê re dixebitin.

Tirkîye gelek caran êrişî Rojavayê Kurdistanê dike û ji ber pêwendiyên HSD û Amerîkayê aciz e lê Amerîka bi berdewamî radigihîne ku HSD hevpeymaneke wan a girîng e.

Tirkîye demên dawiyê di êrişên xwe de saziyên sivil û yê cihên xizmetguzariyê dike hedef û zereke zêde digihîne depoyên avê, stasyonên karebayê û bîrên petrolê.

Li gorî gelek şîrovekarên siyasî, Tirkîye bi van kirinên xwe hewl dide xelkê Rojavayê Kurdistanê ji warê wan koçber bike û ji bo êrişên xwe yê piştî rê xweş bike.

6 şervanên HSDê li Dêrazor û Minbicê hatin kuştin



Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) kuştina 6 şervanên xwe di êrişên rejîma Sûriyeyê de li gundewarên Dêrazorê Minbicê aşkere kirin.

Navenda Ragihandinê HSDê di daxuyaniyekê de ragihand, 5 şervanên wê roja 10ê Sibatê di êrişên hêzên hikûmeta Şamê de li gundewarên Dêrazorê û hatin kuştin. Li gorî daxuyaniya Navenda Ragihandinê HSDê, şervanekî din jî roja 10ê Sibatê li Minbicê di

êrişên artêşa Tirkîyeyê de hatiye kuştin. HSD di daxuyaniya xwe de amaje bi wê yekê dike, êrişên rejîmê û hêzên ser bi wê bûn sedema kuştina gelek şervanên HSDê, ev êriş jî dê bêbersiv nemînin. Navenda Ragihandinê ya HSDê roja 5ê Sibatê jî aşkere kiribû, di êrişêke bi dronan li ser Akademiya Perwerdeyê ya li Kêlgeha El-Omer a li rojhilatê Dêrazorê de jî 6 şervanên HSDê canê xwe ji dest dabûn.

Aliyev cara 5 emîn bû Serokkomarê Azerbaycanê



Li gor encamên nefermî yê hilbijartinên ku doh li Azerbaycanê hatin kirin, İlham Aliyev ji bo cara pêncem bû serokkomar û ji sedî

92ê dengan bidest xist.

Serokê Lijneya Hilbijartina Navendî ya Azerbaycanê Mazahir Panahov di daxuyaniyekê de ragi-

hand ku li vî welatî ji sedî 93ê deng hatine jimartin û Aliyev ji sedî 92,05ê deng wergirtiye.

Dengên namzetê herî nêzî Aliyev ji sedî 2,19 ma. Beşdariya hilbijartina Serokkomariyê ya ku di nav wan de Aliyev jî hebû, 7 namzed haatin beramber hev.

İlham Aliyev ê 62-salî zêdetirî 20 salan li ser desthilatê ye û li şûna bavê xwe, yê ku piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê di sala 1991-an de serxwebûna xwe bi dest xist û 10 salan li Azerbaycanê serokatî kir, zêdetirî 20 salan desthilatdar e.

İlham Aliyev ji sala 2003an ve li ser desthilatdariyê ye û di hilbijartinên 2008, 2013 û 2018an de bi ferqek mezin bi ser ket.

Piştî referandumên sala 2009 û 2016an li Azerbaycanê bi guhertinên destûrî heyama serokkomariyê ji 5 salan bû 7 sal û sînorê dema serokkomariyê hat rakirin.

Mistefa: Wê piştgiya Amerîka ji bo Pêşmerge bidome

Cîgirê Berpirsê Pêwendiyên Derve yê Serokatiya Herêma Kurdistanê Felah Mistefa



ragihand ku hemû berpirsên Amerîkayê piştvanîya xwe ji bo Herêma Kurdistanê dubare kirin.

Şanda Serokatiya Herêma Kurdistanê bi serokatiya Fewzî Herîrî ev çend roj in li Amerîkayê ye û çend peywendiyên fermî pêk tîne.

Cîgirê Berpirsê Pêwendiyên Derve yê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê Felah Mistefa di darbarê naveroka hevdîtinan de ragihand ku "Hem Iraq û hem jî Herêma Kurdistanê dixwazin pêwendiyek stratejîk a demdirêj ligel Amerîkayê hebe. Hemû berpirsên ku me li Waşingtonê hevdîtin bi wan re kiriyê piştvanîya xwe ji bo Herêma Kurdistanê dubare kirin.

Mistefa bal kişand ser wê yekê ku pêvajoyê ber bi qonaxek erênî ve diçe.

Bêgerd Talebanî: Di Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmetan de gelek mijarên 'giring û hestiyar' tên gotûbêjkirin

Wezîra Çandinî û Çavkaniyên Avê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Bêgerd Talebanî



ragihand, Herêma Kurdistanê ji beşdarên herî girîng ên ku îro beşdarî Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmetan bûne ji bo gotûbêjkirina gelek mijarên girîng û hestiyar.

Bêgerd Talebanî îro 12.02.2024an ji K24 re ragihand, beşdarbûna di lûtkeya cîhanî de ji bo hikûmetên gelek welatan pir girîng e. Herwiha beşdarbûna Herêma Kurdistanê di vê çalakiya cîhanî de gelekî girîng e û îro Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî jî dê gotarekê pêşkêş bike.

Bêgerd Talebanî herwiha got: "Li vir gelek mijarên girîng û hestiyar tên gotûbêjkirin, di asta aborî, siyasî, pêwendî, pêşketina teknolojîk û hemû beşên girêdayî geşepêdana aborî. Em îro weke şandeke fermî li gel Serokwezîrê li vir in û beşdarî penalên cuda yê wê lûtkeyê dibin."

Wezîra Çandinî û Çavkaniyên Avê diyar kir, "Dema em gihîştin vir, me ew girigîpêdana ji hikûmeta Îmaratê bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê dît ku îro di rêza pêşiyê ya welatên beşdar di vê lûtkeyê de ye."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî duhî êvarê giheşte Dubayê û ji aliyê Xelîfe Wezîrê Dewletê yê Wezaretê Derve ya Îmarat Şahîn Merer ve hat pêşwazîkirin.

11emîn Lûtkeya Cîhanî ya Hikûmeta li Dubayê îro 12ê Sibata 2024an dest pê dike. Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî jî îro gotarekê di lûtkeya de pêşkêş dike û behsa dîtinên nû yê ji bo pêşketin û aboriyê dike.

Hilbijartin HAK-PAR û partiyên Kurdistanî



Bûbê Eser

Lê hezar mixabin em weke kurdên bakur nizanin an naxwazin wê ji bona gelê xwe bi kar bînin. Ji ber wan berjewendiyên seksî û partiyên, ew îmkânên duxulîqin jî wenda dikin.

Em weke mîletê kurd partî û tevgerên xwe, ne dîr bînin. Li hember bûyer û kiryanan ne xwedî helwestên neteweyî ne. Ji bona serketina gelê xwe, em nikarin pêşiya xwe bi du gavan bibînin. Tim ji bona gavek seksî û berjewendiyên hêzbî em xwe hol dikin û hew.

Ev bû sed salan in, em nikarin dîr û dirêj pêşiya xwe bibînin. Loma bi hevve wenda kirine û dikin. Wendakirinên me jî dibe wendakirine gelê me. Lê em hê jî nikarin xwe biguhrin û helwesteke neteweyî, dîrî berjewendiyên seksî û hêzbaşî tevbigerin.

Em hema carekê jî be nikarin helwesteke neteweyî ku berjewendiyên gelê me tê be, bi hevve bibin xwedî biryareke neteweyî. Ji ber vê ye heta niha em wek kurdên bakurê Kurdistanê me tim wenda kirine.

Em rê û rêbazên serketinê ya nizanin ya jî wan dikin qurbana berjewendiyên xwe yê seksî û partîyê. Em carna ji bîr dikin ku partî ji bona azadiya gelê tene damezrandin. Hemî damezrandina partiyên jî li ser û li gor vî asafî ye. Lê di nava herikandina demê de û ji ber bê erk û wazîfeyî helwestin neteweyî dibin yê seksî û partiyên.

Gelek caran hin îmkân dikevin destên kurdan. Lê hezar mixabin em weke kurdên bakur nizanin an naxwazin wê ji bona gelê xwe bi kar bînin. Ji ber wan berjewendiyên seksî û partiyên, ew îmkânên duxulîqin jî wenda dikin.

Ev helwest di hilbijartinên parlemaniya tirkîyê ya sala 2023an de gelek zelal û eşkere diyar bû ku em hê jî nebûne xwediyê xwe û parastina gelê xwe. Em bêjin ew hilbijartin zêde kurdan eleqeder nake an nedikir. Lê divê piştî wê jî ji bona hilbijartina şaredariyan, ji wê demê de gav û têkîf bihatina avêtin.

Lê weke gelek caran ew jî nebû. Niha jî pir hindik dema hilbijartina şaredariyan maye. Hê jî nerîn û dîtinên gelek partiyên me ne diyar e ku wê bibin xwediyê xwe û çî helwestan.

Me gelek caran di vê derheqê de gotina xwe gotine û nivîsên xwe jî nivîsîne. Lê weha bawerim partiyên me rewşenbîrên xwe cidî nagirin û naxwazin nerîn û dîtinên wan di nava xwe de minaqeşe bikin. Fêr bibin bê ka ew çî dibêjin.

Loma ez dibêjim, di rewşên weha de divê em bizanibin ku xeta neteweyî lawaz bûye. Karên bi hevve ketiye xeterê. Hevdu û rewşenbîrên xwe guhdarî kirin nemaye. Ev sed

neteweyî û pêşketî hema nemane. Tevger û partiyê Kurdistanê li ser piştî sal mezinan maye û ew jî li hev nakin...

Bawer bikin derdê me kurdan gelekî zêde ne. Êşa me giran e. Helwestên me lawaz in. Qaweta me tune ye. Ya girîng jî em hê jî li bakurê Kurdistanê nebûne xwedî eniyêke neteweyî ku em bikaribin li gor wê berjewendiyên gelê xwe biparêzin.

Vana hemiyan didim alîkî û dibêjim: Heger em dilsozên gelê xwe bin. Heger em dixwazin di vê hilbijartinê de, gelê xwe bi tenê nehêlin. Heger em dixwazin xwe îdare û bi rêve bibin. Vaye HAK-PAR weke partîyeke Kurd mafê wê yê hilbijartinê heye.

Ez bim, bê qeyd û şert divê hemî kurdên ji welatê xwe hez dikin, piştgiya xwe bikin. Dibe ku ev piştgirî bibe rêvekirina bi hevve karkirinê. Her weha ev alîkarî dikare li hin bajar an bajarokan kurdan bike xwedî rêveberiya xwe. Di vê hilbijartinê de kurd



salin ku tim kurdan gotine ez û ez. Hê jî rêya ez û em venebûye. Heta ku ew venebe em ê jî nebin xwediyê xwe û tu destketiyan.


Aha kerem bikin, ji hilbijartina şaredariyan re çî ma? Demeke gelekî kurt. Helwestên partiyên ez û ez ê û nerînin seksî êdî bes e. Divê em xwe ji vê azad bikin. Bi ez û ez ê em nagihêjin tu dereke. Em roj bi roj kêr û lawaz dibin. Ziman dimre, nerînin

bibin xwedî yek helwest, wê bi serkevin. Wekî din ji wendakirinê pêve tu tiştek nabe para me kurdan.

Kurdno heger partiyên me hevkarîyê nekin jî divê her kurdên ji welatê xwe hez dikin û mafê wan ya dengdanê hebin. Wî dengê bidin HAK-PARê

Ez weke rewşenbîrekî gelê xwe, di vê hilbijartinê de piştgirî HAK-PARê me.

Çi hat serê Selaheddîn û Başak Demîrtaşê...



İbrahim GUÇLU

